Berfspî û heft bejnbihost

Bi hezaran sal berê mîrek hebû. Ew û jina wî ya spehî li dûrî şerxwazan bi hev re di aştîyê de dijîyan.
Piştî demekê jina mîr bi zarok ma. Wê her roj ji bo zaroka xwe cil çêdikirin. Dîsa rojekê li ber pencerê rûnişt û dest bi çêkirina qazaxekî kir. Hem qazax hûna hem jî ket nav xeyalan:

– Xwezika ji min re keçeke wek berfê spî, lêvên wê wek xwînê sor û porê wê wek abanozan reş bihata dinê.

Daxwazîya jinmîrê bi cih hat. Ji wan re keçek çêbû, lê çi keç! Bi rûyê xwe yê spî yê mîna berfê, bi porê xwe yê reş ê mîna abanozan û bi lêvên xwe yên sor ên mîna xwînê dişibîya firişteyekê. Navê wê Berfspî lê nan. Wan pir ji keça xwe ya delal hez dikir.

Mirazê jinmîrê hate cih, lê ew bi xwe bi vî mirazî re pir nejîya. Wê pişt demeke kin mîr û keça xwe li dû xwe hiştin û çû ser dilavanîya Xwedê.

Sal derbas dibûn, Berfspî mezin dibû. Her ku mezin dibû weke gulên ku vedibin xweşiktir dibû. Ew mezin û xweşik dibû lê mîr jî ji tenêbûnê êdî bê mecal mabû. Dawîya dawîn ji nû ve ji xwe re jineke din anî. Jinmîra nû jî dîsa mîna ya berê pir rindik

bû. Lê mixabin şerxwaz û sêrbaz bû.

Li ba wê neynikeke sêrbazîyê hebû. Wê her tim ji neynika xwe pirs dikir:

– Ey neynika min a xweşik, ji min xweşiktir kes heye li vê dinyayê?

Neynikê bersiv dida:

– Na, ji te xweşiktir kes nîn e li vê dinyayê xanima min.

Û xanimê dema ku dengê neynika xwe dibihîst pir şa dibû.

Dem dibihurî, Berfspî mezin dibû û her ku diçû xweşiktir dibû. Dema ku bavê wê jî çû ser dilovanîya Xwedê, ew êdî keçeke ciwan û delal bû. Ji dêmarîya xwe jî xweşiktir bûbû. Ew pir dilovan bû jî. Wê ji her kesî hez dikir, alîkarîya wan dikir û xwe di ser kesekî re nedidît.

Rojekê dîsa jina efsûnbaz ji neynika xwe pirs kir û got:

– Ey neynika min a xweşik, ji min xweşiktir kes heye li vê dinyayê?

Neynikê bersiv da û got:

– Xatûna min, tu xweşik î, lê Berfspî ji te hezar qatî xweşiktir e niha.

Jina sêrbaz pir hêrs bû. Wisa hêrs bû ku weke dînan xwe bi xwe got:

– Divê Berfspî bimire. Divê ez ji wê xilas bibim.

Wê tavilê gazî nêçîrvanê berdestî kir û ji wî xwast ku Berfspîyê bibe li daristanê bikuje. Qutîyeke bi kilît da nêçîrvan û got:

– Dilê Berfspîyê bike vê qutîyê û ji min re bîne. Ji ber ku anîna dilê wê nîşana kuştina wê ye.

Nêçîrvan ji tirsa jina sêrbaz Berfspî girt û ber bi daristanê ve meşîya. Dema ku gihan daristanê nêçîrvan poşman bû. Dilê wî nehat ber ku keçeke wisa xweşik, delal û bêguneh bikuje. Sedema hatina wan a nav daristanê ji Berfspîyê re got:

– Dêmarîya te dixwaze te bide kuştin. Lê dilê min nayê ber te. Ez nikarim te bikujim.

Nêçîrvan xezalek kuşt û dilê wê kir nav qutîyê. Qutî kilît kir û ew bir da sêrbazê.

Berfspî piştî çûna nêçîrvanî bi tenê di nav daristana mezin de ma. Ew pir tirsîya, dest bi bazdanê kir. Hem baz dida û hem jî digirîya. Piştî demekê bêhnçikîyayî xwe avêt bin dareka keleman. Lê baş bû ku li wir kerguh, simore û xezal hebûn. Ew li derûdora Berfspîyê civîyan. Wan ew aşt kir û bir mêrgekê. Derûdora mêrgê tevde daristan bû. Xuşînîya aveke zelal ku di orta mêrgê re diherikî weke dengê hozanan li nav daristanê olan dida. Çîveçîva çûkan bû. Kûlîlkên rengîn û bêhnxweş weke kirasê bûkekê mêrg xemilandibûn. Te digot qey Berfspî hatîye bihuştekê.

Berfspîyê li derûdora xwe mêze kir. Dît ku li orta mêrgê xanîyekî biçûk ê weke qutîkê heye. Ber bi wî xanîyî ve meşîya û li ber derî sekinî. Pêşî dudil bû. Gelo li derî bixista yan na? Lê dawîya dawîn biryara xwe da û li derî xist. Bîstekê pa, lê kesekî derî venekir. Destê xwe li derî xist, xwe xwar kir û çû hundir. Li hundir maseke biçûk, li derûdora masê heft kursîyên biçûk hebûn. Li ser masê heft sehen, heft kevçî û çetel û



heft qedehên biçûk hebûn. Li odeyeke razanê heft textên biçûk dîtin. Lê xanî tevlihev bû. Te digot qey ew mala ya zarokên biçûk e.

Berfspîyê li derûdora xwe mêze kir û xwe bi xwe got:

– Xuyaye yên ku li vir dimînin xanîyê xwe pirî caran paqij nakin.

Wê dest bi paqijkirina xênî kir. Berê xanî da hev û maşt. Bi dû re firaq şuştin. Paşê derket li derûdora xênî kulîlk berhev kirin û xanî bi wan xemiland.

Gelekî westîyabû. Çû li oda razanê xwe li ser textekî dirêj kir. Hema di cih de kete xeweke kûr û şîrîn. Dema ku Berfspî di xewa şîrîn de bû, xwedîyên malê hatin. Ew ketin hundir, wan li derûdora xwe mêze kir û got:

– Ev xanîyê me çi xweşik bûye. Kê wisa paqij kirîye?

Derbasî oda razanê bûn. Berfspîyê ew ode jî paqij û xweşik kiribû. Lê dema ku wan Berfspî li ser textekî razayî dît, hemû şaşmayî man û wan got:

– Ev keça delal û xweşik kî ye gelo? Tu dibê qey ew firişte ye.

Hina jî got:

– Agahdar bin! Wê şîyar mekin.

Hemû li alîyekî odê rûniştin û wan heyran heyran li Berfspîyê nêrî.

Di eynî demê de dêmarîya Berfspîyê ji neynika xwe pirsî:

– Ey neynika min a xweşik, tu kesa ji min xweşiktir heye li vê dinyayê?

Neynikê dîsa bersiva sêrbazê da û got:

– Xatûna min, hê jî Berfspîya ku li mala bejnbihostan dijî ji te xweşiktir e.

Bi gotina neynikê sêrbaz har û dîn bû û got:

– Te got çi? Ma ew nemirîye? Baş e, ku wisa ye, ez ê wê bi destên xwe bikujim.

Wê li kûrahîya qesrê, li jêrzemîn jehr çêdikir. Ji wê jehrê hinek girt û got:

– Çend dilopên ji vê jehrê, dê Berfspîyê bikin xeweke kûr. Bes maça mîrekî dikare wê ji xewê şîyar bike. Lê ew jî nabe. Ji ber ku bejnbihost ê wê tavilê defin bikin.

Dêmarîyê selikek tijî sêv kir. Wê çend dilopên jehrê li ser sêvekê rijandin û ew sêv jî danî ser sêvên din.

Wê cilên kevn li xwe kirin. Te digot qey pîreke heftê salî ye. Ji neynikê cihê mala bejnbihostan fêr bû. Selika xwe hilda û da rê.

Berfspî dema ku şîyar bû, dît ko bejnbihost li hawîrdora wê civîyane. Wê lêborîna xwe ji wan xwast. Paşê çîroka xwe ji wan re got.

Dilê wan bi Berfspîyê şewitî û wan bi hev re biryar da ku ew li ba wan bimîne. Berfspîyê jî pêşnîyara wan bi kêfxweşî qebûl kir.

Roja din dema ku heft bejnbihost ê biçûna karê xwe wan ji Berfspîyê xwast ku ew derî ji kesî re veneke. Wan di heman demê de da xuyakirin, ku ew sêrbaz cihê Berfspîyê bizanibe, dê bixwaze wê bide kuştin.

Piştî çûna bejnbihostan, Berfspîyê dest bi karê malê kir. Dema ku karê xwe qedand, xwast ku xwe piçekî dirêj bike. Lê dengê derî bihîst. Wê bawer kir ku bejnbihost in. Derî vekir, dît ku pîrejinek bi selikek sêv li ber derî ye.
Pîrê sêvek dirêjî Berfspîyê kir û got:
– Fermo, a ji te re sêvek, keça xweşik û delal.

Berfspî qet ji pîrê neket şikê. Sêva ku pîrê da wê girt. Çawa ku sêv gez kir dilê wê bihurî û ket erdê. Sêrbaz tavilê di nav daristanê de wenda bû.

Dema ku bejnbihost hatin malê, wan dît ku Berfspî li ber derî dirêj bûye. Wan ew girt û bir hundir. Ji bo ku Berfspîyê şîyar bikin, çi ji destên wan hat ew kir. Lê mixabin bê encam man. Te digot qey heft sal in ku ew mirîye. Gelekî xemgîn û dilşikestî bûn. Wan dest bi girîyekî dilsoj kir. Lê wan dît ku girî bê feyde ye. Wan dev ji girî berda û bi hev şêwirîn ka dê çi bikin.

Dilê bejnbihostan nehat ber ku Berfspîyê defin bikin. Wan tabûteka ji zêr û krîstal çêkir. Kulîlkên spî berhev kirin û weke doşegekê di binê tabûtê de raxistin. Bedena Berfspîyê ya nelivbar xist nav tabûtê. Wan tabût li bin dareke nêzî malê danî. Hem bejnbihostan û hem jî lawirên nav daristanê her roj dihatin li ber tabûta Berfspîyê hêstir dibarandin. Te digot qey ew razaye. Kulîlkên ku Berfspî li ser dirêj kiri-

bûn jî mirov digot qey nû berhev kirine.

Serê sibeyekê mîrek li ser hespa xwe di wir re derbas bû. Li tabûtê mêze kir. Oy rebîyo ew çi bû! Ji xweşikbûna Berfspîyê çavên wî delîyan. Te digot qey ew peykerek e.
Dema ku ew bi xwe ve hat ji bejnbihostên ku tabûta Berfspîyê dipan pirsî:

– Ew kî ye ku li vir razaye? Ez dikarim wê maçî bikim?

Wan di maneya erê de serê xwe hejand. Mîr çawa ku Berfspî maçî kir, ew şîyar bû.

Bi çavvekirinê re Berfspî bû dildara mîrê ku ew ji mirinê xilas kir.
Ji kêfan te digot qey bejnbihost û lawir dikin bifirin. Ew li derûdora Berfspîyê civîyan, ketin govendê û wan bi hev re got:

– Bijî Berfspî û Mîr!

Mîr ji Berfspîyê daxwaz kir ku ew bi hev re herin qesra wî. Berfspîyê daxwazîya wî bi kêfxweşî qebûl kir.

Bejnbostan soz da Berfspîyê ku gelek caran herin serdana wan. Ew xwedîyê soza xwe bûn. Berfspîyê ew yek û yek maç kirin û xatir ji wan xwast.

Piştî roja ku hatin qesrê, mîr heft roj heft şevan dawetek li dar xist. Berfspî û mîr zewicîn. Heta mirinê jîyaneke bextewar bi hev re jîyan.

Sêrbazê vê carê bi dilekî rehet ji neynika xwe pirsî:

– Ey neynika min a xweşik, tu kesa ku ji min xweşiktir ma ye li vê dinyayê?

Neynikê dîsa bersiva sêrbazê da û got:

– Xatûna min, hê jî Berfspîya ku bi mîr re zewicîye ji te xweşiktir e.

Sêrbaz bê hiş ma û pirsî:

– Berfspî hê dijî ha? Te çi got neynika lanet, ev yek ne mimkun e.

Ew wisa hêrs bû ku neynik avêt erdê. Bi pînan ket ser neynikê û ew hûr û pişûr kir. Sêrbaz ji hêrsan weke dînan bû. Tiştên derûdora xwe hemû xera kirin û şikandin. Ji hilma şûşeyên jehrê xewirî û kete erdê. Dema ku şîyar bû, tiştên ku qewimîbûn nehatin bîra wê. Dawî ji sêrbazîya wê hatibû. Êdî wê ne dikarî tu zerarê bide Berfspîyê û ne jî kesekî din.

Wergera ji swêdî: Sabîha Otlu